Halkların Demokratik Partisi (HDP) Van milletvekili Murat Sarısaç, Avesta Yayınları'ndan çıkan "Kürdistan Tarihi" kitabının mahkeme tarafından yasaklanmasını Türkiye Büyük Millet Meclisi (TBMM) Başkanlığı'na sordu.



Soru önergesinde, şu ifadelere yer verildi: "Anayasa'nın 28. Maddesinde basının özgür olduğu ve sansür edilemeyeceği yönündeki vurgusu ile Basın Kanunu'nun 3. Maddesindeki 'Basın özgürdür. Bu özgürlük; bilgi edinme, yayma, eleştirme, yorumlama ve eser yaratma haklarını içerir' şeklindeki açık ifadesi AKP iktidarlarının kitaplarla

kavgasının siyasi olduğunu göstermektedir.

Oysa Türkiye siyasi tarihinde sık sık basılı dokümanların dönem dönem tartışmalara konu olmasına, yayınevlerinin dava tehditleriyle karşı karşıya kalmasına rağmen baskı, tehdit ve sansür uygulamalarının anlamsız olduğu zamanla anlaşılmalıdır. Dolayısıyla 2001 yılında Devlet Güvenlik Mahkemesi tarafından toplatılan 'Kürdistan Tarihi' adlı eserin 17 yıl aradan sonra yeniden yasaklanması, Türkiye'nin nereden nereye geldiğini göstermesi açısından ibretlik bir olaydır."

Ne Olmuştu?

Kürt Araştırmaları Merkezi tarafından hazırlanan ve Avesta Yayınları'ndan çıkan "Kürdistan Tarihi" kitabı, 18 yıl sonra yeniden yasaklandı.

"Kürdistan Tarihi" adlı kitabın ilk baskısı 2000'de İstanbul Devlet Güvenlik Mahkemesi (DGM) tarafından toplatılmış, yapılan yargılamada yayınevine para ve hapis cezası verilmişti. Kitap, 18 yılın ardından Ayrıcalık Sulh Ceza Hâkimliği tarafından yasaklandı. Öte yandan, İstanbul Cumhuriyet Başsavcılığı, Avesta'nın 10 kitabı hakkında daha bilgi istedi.

Nerina Azad

Bereya Yekgirtî a Kurdî: Metirsî li ser Rojhilatê Kurdistanê hene



Bereya Yekgirtî ya Kurdî li Rojhilatê Kurdistanê ragihand, ku pîlanên gellekî metirsîdar, ji bo sepandina tevliheviyê û şer û wêraniyê û kêmkirina dengê xelkê

tên kirin û hin alî dixwazin piraniya ziyanan gelê Kurd bide. Encûmena Navendî ya Bereya Yekgirtî a Kurdî li Rojhilatê Kurdistanê, di daxuyaniyekê de eşkere kir, ku di heyama du mehên derbasbûyî de, di bin fişara dezgehên emnî de, wan çar caran cihê civînên xwe guherandine heya ku karî di dawiyê de bicivin.

Di daxuyaniyê de, Bereya Yekgirtî a Kurdî hişyarî daye xelkê Rojhilatê Kurdistanê, ku hin kes dixwazin di dema çêbûna her guhertinekê de, piraniya tevahiya ziyanan, di stiwê gelê Kurd û Kurdistanê de be.

Bereya Yekgirtî a Kurdî tekez kir, ku pêwîst e xelk bi hişyarî û hevgerî rastî rewşê bîn, daku ew guhertinên dahatî derfet bin neku gef bin. **kurdistan24.net**

Serokê berê yê Catalonia: Ez dev ji mafê serxwebûnê bernadim



Serokê berê yê Catalonia Carles Puigdemont ragihand, ku ewê serdana hemû welatên cihanê bike, daku piştewaniyê ji serxwebûna Catalonia re bidest bîne. Par piştî ku Herêma Catalonia referanduma serxwebûnê encam da, welatê

Ispania ew referendum red kir û bi awayekî rasterê desthilata xwe li ser wê herêmê sepand û biryara girtina Carles Puigdemont da. Carles Puigdemont di Mijdara 2017an de, bi neçarî berê xwe da welatê Belçîka û piştî demekê, gava ji Finlenda

bi rêya Almanya vedigeriya Belçîka, ji aliyê polîsên Almanî ve hat girtin. Destpêka vê mehê, dadgeheke Almanî biryar da, ku çêdibe ew Puigdemont radestî Ispania bikin, bi tomata ku wî pereyên giştî bihedir daye, neku ji bo tomata şikandina biryarên Hikûmeta Ispanî.

Piştî vê yekê dadgehê biryara azadkirina wî da û ew jî vegeriya welatê Belçîka, di kongirekî rojnamevanî de, li gel serokê niha yê Catalonia (Kim Tura) serokê berê yê Catalonia Carles Puigdemont got: Ev ne rawestgeha min ya dawî ye û ev jî ne dawiya geştê min e. Ezê serdana hemû welatan bikim, daku piştewaniyê ji serxwebûna Catalonia re di cihanê de peyda bikim. **BasNews**

Trump hewla avakirina "NATOyê Erebî" dide

Serokê Amerîka Donald Trump hewl dide NATOyê Erebî li Rojhilata Navîn li dijî Îranê dirust bike.

Ajansa "Reuters" li ser zarê çend jêderên ji Koşka Spî ya Amerîkî belav kir, berpîrsên Amerîka û çend welatên Erebî di hewla avakirina bereyê hevbeş ya ewlehî – siyasî didin, bo rêgiriya li hejmûna Îranê li navçê bike.

Çar jêderan ji wê ajansê re gotiye, Koşka Spî dixwaze hevkarîyê bi welatên Kendava Erebî, Misr û Urdî re derbarê berevaniya mûşekî û rahênkirina leşkerî û rûbirûbûna terorê xurt bike.

Diyar kir jî, berpîrsên Koşka Spî wek heman hevpeymanîya "NATO" yê çapeke Erebî bi hevpeymanên wê yê Sune re dirust bike.

Aşkere kir jî, Serokê Trump dixwaze wê hevpeymanîyê ya navê bi awayekî demkî kiriye "Hevpey-



maniya Rojhilata Navîn a Stratejîk" di lûtkeya ku biryar e 12 û 13 Cotmeha bê li Washingtonê birêve biçê de gotûbêj bike. Wan jêderan amaje bi yekê kirin, berpîrsên Siûdiyê sala bûrî û berî serdana Trump ji Siûdiyê re bîrokeya avakirina hevpeymanîyê

ewlehiyê pêşkêşî Amerîka kiribûn, lê ew bîroke di cihê xwe de mabû. Washington, Riyaz û Ebû Dehbî Îranê tometbar dikin, ku aramiya têk didin û aloziyan li hin welatên Erebî dirust kirin, ji bilî gefa Îranê ya zêde li ser Îsraîlê. **kurdistan24.net**

Efrîn... Erebên Xûtaya Rojhilat red dikin ji malên Kurdan derkevin

Koçberên Xûtaya Rojhilatku li Efrînê hatine bicihkirin tevî rêkeftinê jî red dikin ji malên kurdan derkevin û xwepêşandanek pêkanîn.

Rêxistina Mafên Mirovan berî 3 rojan ragihandibû ku Encûmena Sivîl a Mabeta û koçberên Xûtaya Rojhilat li hev kirine ku ew erebên Xûtayê di heyama 3 roja de ji 56 malên Kurdan ku dagirkirine derkevin û welatîyên Kurd ku xwediyan wan xaniyan in vegevin malên xwe.

Lêbelê hat diyarkirin tevî ku ji herdu aliyan komîteyek hatibû avakirin jî wan koçberên Xûtayê red kirine ku ji malên Kurdan derkevin û xwepêşandanek pêkanîn.

Di wê xwepêşandanê de erebên Xûtaya Rojhilat daxwaza rûxandina rejîma Sûriyê kirin û xwestin ku li navçeyên xwe yê berê vegevin. Herwiha li gor nûçeyê K24ê koçberên Xûtayê gef li komîtê xwarine û piştî wê çekdaên Cebhe el Şamiyê endamê encûmena Mabeta yê bi navê Arif Mihemd Elî û kurê wî Ciwan, girtin û eşkence kirin û piştî demekê ew her du jî berdan.

Bajarê Efrînê yê Rojavayê Kurdistanê 18ê Adarê ji

aliyê çekdarên ser bi artêşa Tirkîyê ve hatibû dagirkirin û piştî dagirkirina Efrînê bi hezaran Kurd ji neçarî ji



malên xwe bûbûn û çekdarên ser bi Tirkîyê ve jî erebên Xûtaya Rojhilat li malên Kurdan bicih kiribûn ku heta niha jî dagirkirina malên Kurdan berdewam dike. Piraniya xelkê navçeyê Mabeta Kurdên Elewî ne û ji ber wê yekê gelek bînpêkirin ji aliyê çekdaran ve li dijî wan tên kirin û navçeyê Mabeta 15 kilometre dûrî navenda Efrînê ye. **BasNews**

Mesrûr Barzanî li Emerîka ye û ligel rayedarên Emerîkî hevdiîtin pêk anîn

Şewirmendê Encûmena Asayîşa Herêma Kurdistanê tekeziyê li ser pêkanîna hikûmeta Iraqê li ser binemaya yekrêzî, hevsengî û hevbeşiya rasteqîne dike.



Şewirmendê Encûmena Asayîşa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî li Koşka Spî ya Amerîka ligel Cîgira Şewirmendê Encûmena Asayîşa Niştimanî Mira Ricardel bo guftûgokirina hejmarek pirsan civiya.

Mesrûr Barzanî û Mira Ricardel tekezî li ser temakirina şerê li dijî DAIŞê û berdewamiya hevbeşiya ligel hêzên Kurdî û Hevpeymanîya Navdewletî ya bi serokatiya Amerîka kirin.

Derbarê pêkanîna hikûmeta Iraqê de, Mesrûr Barzanî diyar kir, çavê Herêma Kurdistanê li beşdarîkirina di hikûmetekê de ye, ku binemaya yekrêzî, hevsengî û şeraketa rasteqînê tê de parastî be, ev jî wek daxwazeke gelê Kurdistanê ye û bi piştbestin bi destûrê ye. Herwiha Mesrûr Barzanî û Mira Ricardel behsa piştewaniya berdewam a Herêma Kurdistanê bo koçberan bi giştî û Xiristiyanan û Êzidiyan bi taybetî kirin, ku ji ber ne aramiya rewşa navçeyên wan berên xwe dane Herêma Kurdistanê. **avestakurd.net**

PSK: Piştgiriya Zarok TV Dikin

Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) liser sizadan a ZarokTV, daxuyaniyek piştgiriya ji bo ZarokTV belav kir. Kopyeyek jê gihişt K24. Ev naveroka daxuyaniya PSK ye. Desteyê Bilind ya Radyo û Televîzyona Tirkîyê (RTUK) ceza da Zarok TV. RTUK belav kirina kilamên Kurdî, ku têda bêjeya "Kurdistan" heye, wekî sedem nişan da û got, ku "Kurdistan ji aliyê Cumhuriyeta Tirkîyê nehatiye qebul kirin" û ev yêka jî xizmet e bona "rêxistinê terorê". Biryara hanê ya RTUK xizmeta asîmîle kirina zarokên Kurd dike û her usa gef e li ser radyo û televîzyonên dinê û gaweke ber bi qedexeyê kirina bêjeya Kurdistanê hatiye avêtinê.

Biryara hanê ya RTUK, ku girêdayiya Wezareta Çand û Geştûguzar e, nişan dide dewleta Tirk derheqê pîrsa Kurd da vedigere siyaseta berê û amaje bi vê yekê dike, ku Tirkîyeyê nu di bin rêvaberîya "İttifaka Cumhur" da wê çawa be.

Em biryara RTUK ya derheqê Zarok TV bi tundî mahkûm dikin û daxwaz ji aliyên hestiyar, ji hêzên aşitîxwaz, azadîxwaz û demokratîk dikin, ku biryara hanê ya dij-demokratîk û dij Kurdistanê dengê xwe bilind bikin. Partiya Sosyalîst a Kurdistanê piştgiriya zarok TV û radyo û televîzyonên dinê, ku rû be rûyê kiryarên hanê ya RTUK ne. **kurdistan24.net**

MSD û hikûmeta Sûriyê li ser çend xalan lihev kirine

Maclîsa Sûriyeya Demokratîk (MSD) derbarê çûna şanda wê bo Şamê û hevdiîtinên wê bi berpîrsên hikûmeta Sûriyê de daxuyaniyek belav kir û da zanî, li ser çend xalan rêkeftinê çê bûye. Di daxuyaniya MSDê de hatiye, şanda MSDê li ser vexwandina hikûmeta Sûriyê çûye Şamê û armanca çûna şandê ew e, ligel hikûmeta Sûriyê hemû pîrsgirêkan di hemû waran de çareser bike. Diyar kir jî, berî demekê li bajarê Tebqayê hin civîn pêk hatibûn û tê de karûbarên xizmetguzariyê hatin gotûbêj kirin.

Aşkere kir jî, di civînan de hin biryar hatin standin, wek avakirina komîteyan li ser hemû astan bo pêşvebirina danûstandinan, danîna sînorekê ji tundî û şer re û nexşerêyekê ji bo Sûriyeyê demokratîk nenavendî.

Di 26ê mehê de şandeke MSDê bi serpirştîya Hevseroka Desteya Cîbicîkar ya MSDê Îlham Ehmed ji bo pêkanîna danûstandinan bi rejîma Sûriyê re û gotûbêj kirina rewşa Bakurê Sûriyê serdana Şamê paytexta Sûriyê kir. **kurdistan24.net**

Ji Quştepe heta Enfalê û tevkujiyên bêrawestan!

Pêşkêşî du hevalên min: Kovan û Maaf Barzanî

Di menê Yekemîn
Tîrmeh li Kurdistanê bi piraniya rojên xwe yên germ re dem û saetên reş an jî baştîre bêjim kêma rojên xweş bi bîra me tine!

Di rûyê wê yê tije êş, di çavên wê yên tije tirs û di lerzîna destên wê yên mandî de dîsa jî hêzek heye, lê sîr û gotinên hê nebihîstî jî hene. Ew li min dinêre û bi gotineke watedar sirra mayîna xwe a li ser pêyan aşkera dike: "Hêvî haveynê jiyana min bûye kurê min..."

Navê wê "Xemê. B" ye û naxwaze kes wê binase. Belkî niha nebûye 60 salî lê weke pîrejineke 80 salî dixuyê û ev jî dide diyarkirin ku çî çêz û tam ji salên bihara jiyana xwe nekêşane. Serbihûriya wê romaneke rastîn a nenivîsandî ye.

Xemê gotin û peyvên xwe wisa xweşik beyan dike ku destanbêjên sedsalên berê bi bîra mirov tine. Carna li kurê xwe dinêre û wiha dibêje: "Dema wê rojê sibê zû êrîşî kempa me kirin em hemû razayî bûn. Ji bo peydakirina pariyekî nanê jiyane, malxê min, du tî û xezûrê min yê 75 salî diçûne bajarê Hewlêrê. Karkerî û carna jî di nava erdê gundiyan de dixebitîn. Hemû deh meh bû ku ez hatibûm wê malê û 19 salî bûm. Zikê min sê mehî bû. Kovan 6 mehan piştî wê roja tehil hate dinê..."

Li kurê xwe dinêre û bi qasî ku dikare naxwaze li cem bûk, nevi û kurê xwe bigirî, lê dema li wêneyê piştê serê xwe yê bi dîwar ve daliqî dinihêre, hêsirên çavan weke baranê dibarin, nikare xwe bigire. Dema ew bi hesrekeke kûr behsa hevjinê xwe dike, li ser evîneke nivçûmayî jî diaxibe: "Niha em li Barzan bûn ku me ji hev hez dikir. Ew 4 salan ji min mezintir bû. Du sala kêşa heya yên me razî bûn ku min bidenê, lê piştî zewacê jî em tenê deh mehan bi hev re man. Gelek xweziyên me hebûn û roja ku zanî ez pêgirana(hemle) me wiha got: "Binihêre Xemê eger kur bû navê wî Dilşad e, bes eger keç bû navê wê Gulhat e..."

Dîsa li kurê xwe dinihêre û bi van gotinên tije axîna re em jî hemû li wan dinihêrin û veciniqîneke tije hestên dilsojiyê riha me dadigire. Min jê pirsî lê navê kurê te Kovan e..."

Belê êdî ew nema ku bi navekî wiha re dixweş bibe. Min ji ber êş û elemên ku me bi çavê xwe dîtin, navê Kovan danî ser kurê xwe yê paşbab. Ez ji bo xeman hatibûn dinê û navê min jî ji xwe Xemê ye..."

Wê rojê çî qewimî?
Bila kes nebîne, xwedê bi nisîbê kesî neke, ya me dît îşlelah kes nebîne. Weke weşşan hatin ser serê me. Ber deriyên hemû malan girtin, hinek li derve û du-sê kes jî bi postalên xwe yên pîs ve diketin hûndir. Wê rojê yek kes jî ji

kempê derneketibû. Hemû zilamên nav malan bi zorê ji nav cihan derxistin. Li kêleka jin, zar û dayîkan derxistin. Tu



dem û wext nedan ku heta kincên xwe jî bikine ber xwe. Li cem Refîq Hizbî(1) û Beesîyan çî merhemet û mirovahî nebû. Weke goran pirdidane ciwan û zilaman. Tîyê min ê biçûk hê 15 salî bû. Xwe li bersingê diya xwe da û bi dengê bilind qîriya, lê piştê stûyê wî girtin û bi dûv xwe re kişandin. Tevî hemû qîrîna, hawar û daxwazên ku me ji wan dikirin, çar kesên malê bixwe re birin, wê rojê qîrînen jin û zarikan esman jî tije kiribû..."

We texmîn dikir ku êdî ew venagerin?

Na! Ez heya sala 2003'an jî bi hêvîya vegera malxê xwe bûm, lê xwesûya min heya roja mirina xwe wiha digot: "Keça min ew birin û êdî venegeriya..." Ew bi wê êş û xemê çû, gotin jî rast derketin, ne yên me û ne jî hezaran kesên din..., kes venegerî nav me. Hemû winda kirin. Bûne qurbana şerê Îran û Îraqê, qurbana wan Kurdên ku li aliyê din ê sinor bûn û em jî li vira hêsirên destê Sedam bûn..."

Debara jiyana we li pey wê rojê bi çî awayî derbas bû?

Min û xwesûya xwe di nav malên Hewlêriya de weke xûdam kar dikir. Carna roj hebû me sê-çar mal diguherandin. Wan salan xelkê Hewlêrê gelek qenci li me kirin. Me karê paqijiya malan dikir û êvarê jî vedigerîn mala xwe a kempê ku tim jî aliyê îstixbaratê ve dihate kontrolkirin. Jiyana wan salên nexweş qet û qet jî bîra min naçe, lê dawî bi jiyana wan kesên jî hat yên ku hê di bihara jiyana me de ew qedera kirin para me..."

Xemê hê jî bi wêneyê hevalê xwe re dijî û carna jî pêre xeber dide.

"Hinek caran çend saetan li hemberî wêneyê wî disekinim. Pêre diaxivim. Li ser hêvî û xweziyên ku tev bi avê de çûn. Li ser delalî û salên xweş-nexweş yên jiyane pêre diaxivim, lê ew bersiva daxwaz û pirsyarên min nade! Bêdeng e û tenê li min dinêre!. Qet bawer nakim ku ew bejna bilind, çavên zer û kena wî ya xweş careke din nebînim..."

31'ê Tîrmehê bû!

Sibeha roja 31. 07. 1983'an bû.

Cih: Qempa Quştepe li nêzî

bikin, li ser şerê kafir û mislmanan nazil bûye.

Bihara sala 2005'an min çîroka Enfalê ji zimanê çend dayikên kurd(wek şahidên zindî) li gundê Barzan bihîst ku niha jî dengê wan ê melûl di guhê min de ye. Ew xemgîni û hesretên bêderman, hezaran xewnên ku dikarin bibîne rastî, xwezî û daxwazên ku bêbersiv mane, tev bûne qurbana xeyalên pûç yên mirovekî dîn û har yê otorîter. Desthilata otorîter a ku êdî ne navek jê maye û ne malek ji xwediyên wê re! Beesîyên cîneyetkar çûn û winda bûn, lê şûnewarên kiryarên wan yên tije hovîti dê zû bi zû ji hişê civakê winda nebin.

Piştî tevkuji û wendakirina heşt hezar Barzaniyên çampa Quştepe û deverên din ên başûrê Kurdistanê, bi nêzîkbûna dawîhatina şerê du welatên Îran û Îraqê re li sala 1988'an sed rojên herî reş xwedî nasavekî bûn ku weke Enfalê de qet ji bîra mirovahiyê neçin.

Tevkujiya 182.000 kesên bêşûc!

Ew sal salên qedere bûn, lê roj ji roja berê zêdetir siyaseta dewletê a qirêj û tunekirina kurdan ber bi pêşve diçû. Hêzên kurdan yên siyasî jî zêde xwedî îradeyeke ser-

piraniya herêm û gundên Germiyanê

Qunaxa çaremîn : Ji 3'ê heta 8ê gulana sala 1988'an li herêma Qelay Sîyoke û Şêx Berzînî

Qunaxa pênc, şeş û heftemîn: Ji 9'ê gulanê heya 25'ê tebaxa sala 1988'an li herêmên Dukan heya sinorê Rewandiz berdewam bû ku têda çekên kîmyayî gelek caran hatin bikar anîn.

Qunaxa heştêmîn û dawiyê jî: Ji 26'ê Tebaxê heya 6'ê îlona sala 1988'an li herêmên Behdînan û çendîna gundên din ku têda çekên kîmyayî jî bi giranî hatin bikar anîn.

100 rojên Enfalê reştirîn rojên jiyana kurdan tînen hesibandîna ku niha jî ne ji aliyê pîsorên kurdan û ne jî ji aliyê rêxistinên mafên mirovan ên navneteweyî ve lêkolîneke berfireh li ser nehatiye çêkirin.

Di wan rojên reş de berê cih, gund an jî herêm ji hêla Beesîyan ve dihatin destnîşankirin, piştê gel li cihê kom dikirin û di dawiyê da jî ew tev bi hev re dikuştin û gelek caran jî ew zindî bi gor dikirin . Bi taybetî jî li dijî gundî û cotyarên kurd ku ji şoreşgeran re weke gola avê û jiyane bûn, bi dijwarî ketibûn liv û lebateke



bixwe nebûn û mixabin weke "amrazeke rojê" di destê Îraniyan de dihatin bikaranîn. Hinekan jî xwe avêtibûn paşila Beesîyan û wê çaxê jî li benda otonomiya Sedam bûn!. Bi giştî wan salan hêzên siyasî li Kurdistanê derfetên mezin ji dest dan. Hingî "stratejiyeke hevgirtî" dikarî gelek destkeftên mezin ji kurdan re bike mal. Di rewşeke wiha de kurd ketin ber bayê reş ê Enfalê. Bêguman ger Sedam kesekî şerxwaz û ehmeq nebûya an jî baştîre bêjim tenê êrîşî ser welatê Kuvêyt nekira, belkî îro li başûrê Kurdistanê rewşeke din hebûya. Di wan salên dijwar de heşt qonaxên ku operasyonên nîşkujiyê te de derbas bûn, wiha bûn:

Qonaxa yekemîn: Ji 23'ê sibatê heya destpêka Adara sala 1988an li herêmên di bin desthilatdariya hêzên YNKê da.
Qunaxa duyemîn: 22'ê Adarê heya yekê îlona sala 1988an li herêma Qeredaxê
Qunaxa sêyemîn: Ji 7 heta 29'ê nîsana sala 1988'an li

hemû alî. Wan dixwestin ava gola ku masî ji bo jiyane hewcedarî wê bûn, heya dilopa dawiyê biçikînin. Beesîyên cîneyetkar piştî zêdetir ji 1400 salan cewherê wê sûreya Quranê li Kurdistanê ku zêdetir ji sedî 95'ê a nifûsa wê mislman in, careke din di piratîkê de dan xuyakirin!


Dîmenên duyemîn, sêyemîn û çaremîn jî bila bimîne bo heftiyên din.

(1). Ereben neteweperest, Beesîyên perwerdekirî û dewredîtî ku di parastina dewletê de kar dikirin û sîxûr bûn. Di nav wan gelek kurdên xwefireş jî hebûn.



Kakşar Oremar

Împeratoriya Osmanî û netewetîya kurd...



İbr ahîm Guçlu

Ji bona ku sedemên belavbûna Împeratoriya Osmanî bê diyar kirin, divê ku mirov li ser avabûna Împeratoriya Osmanî raweste.

Împartoriya Osmanî jî, di destpêkê de encama desthilatdarî û şerê bandorî ya malbeta Osmanî dest avabûna xwe kir.

Piştî ku di nav eşîr û cemaatên cihê û cihê de yekîtiyek pêk anî, Împartoriya Osmanî, ji bona ku desthilatdariya xwe fireh bike, ji bona xwe siyaseta û mejiyekî emperyal û kolonî çêkir; firehkirina sînorê Osmaniyan ji bona xwe kir armanc.

Ev siyaseta Osmaniya, bi awayekî siyaseta avabûyîna Împartoriyê erebî, wek Împartoriyên eyyûbî, emewî û Edulusî bû.

Osmaniyan jî ceribandina desthilatdariya Îslamê, eyyubîyan, emewîyan, endulusiyê ji bona xwe wek wîzyon û stratejiyekê tespît kirn. Osmanî û di ev stratêjiya xwe de jî bi ser ketin.

Osmaniyan, bi şer û êrişkeriya emperyal heta ber deriyê Wîyanayê çûn û li wir şikest xwarin, vejeriyan.

Lê encama vê êrişê Balkan ket bin bandora Osmaniyan. Li Balkanan jî Yunanî û Bulgarî û gelek gelên din dijiyan; ev gelan, herêm û welatê wan gelan ketin bin bandora Osmaniyan. Cezîra û welatên Ereban jî ket bin bandora Osmaniyan. Kurdistan û Ermenîstan jî ket bin desthilatdariya Osmaniyan.

Osmaniyan Împartoriyek ava kirin. Di Osmaniyan de gelên bindest desthilatdariya merkezî bi Osmaniyan re parve nedikir û gelê bindest ji desthilatdariyê dûr dihatin sekinandin.

Bes gelên bindest li herêmên xwe nîv-azad û nîv-otonom bûn. Ev yeka di Împartoriya Osmanî de her dem dibû pirsgrêkeke mezin û şerhildanan. Lewra qanûneke xwezayî heye, ku her kesek û her gelek û her netewek dixwaze ku qasî kesê din, gel û neteyên din xwediyê maf be.

Împartoriya Osmanî, dewleteke nîv-merkezî û feodal û kolonyalîst bû. Di Împar-

atoriya Osmanî de her gel, weletek, herêmek nîv-azad û nîv-otonom bû. Lê ev sistema ji bona gelan zîndenek bû. Ji bona vê yekê dema ku Împartoriya Osmanî tê bi nav kirin, wek zîndana gelan dihat bi nav kirin. Rastî jî, “Împartoriya Osmanî zîndana ku gel tê de dijî bû.” Di Împartoriya Osmanî de desthilatdariya merkezî di destê Osmaniyan de bû.

Osmaniyan desthilatdariya xwe bi ew kesên ji gelên bindest hatibûn dida meşandin.

Leşkerê Osmaniyan jî, leşkerê taybetî bû jê re digotin ku “Yeniçerî”. Yeniçerî, ji zarokên gelên bindest yê dihatin ava dibû. Piştî ku zarok mezîndir dibûn û dibûn leşker, wan dê û bavên xwe; ê girîngtir jî gel û netewa xwe nas nedikirin. Leşker ji kesên bê kok û bê esil ava dibû. Ev leşkeriya bê kok û bê esil û bi wateyêke din bê netewe, wê demê gelek bi hêsanî û bê tirs û bê wîjdanî dikarî êriş bike ser gel û herêmên din. Li ser gelan û herêmên gelên ji Osmaniyan cuda bandoreke xurt ava dikirin û tadeyêke mezîndir li ser wan dimeşandin.

Gelên di bin bandora Osmaniyan de jî, ji bona, ku ji bin bandora wan derkevin, azad û serbixwe bin jî, Kurd di serî de, li herêmên xwe li hemberî desthilatdarî û karbidestîya Osmaniyan serhildidan. Lê hezar mixabin ev gelên bidest heta beriya salên navîna 1800-î nikarin ji bin bandora Împartoriya Osmaniyan derkevin.

Piştî Şoreşa Fransayê (1789), li dinyayê û bi aybetî jî li Ewropayê nasyonallîzm pêş ket û pêvajoya dewletên milî dest pê kir. Encama Şoreşa Fransayê derket holê ku bi sistemeke otoriter û hişk ya kolonyalîst, li herêmên din desthilatdarî û bandor meşandin gelek zehmet e. Lewra di nav gelên balkanî û ne balkanî de şûreke nû ya milî çê bû; ji bona azadî û serxwebûna xwe tevdi-geriyan.

Di vê qonaxê de di nav rewşenbîr û desthilatdarên Osmanî de jî minaqeşeyan dest pê kir. Beşek desthilatdar û rewşenbîrên Osmanî, gelek aşkere diyar kirin, ku bi sistemeke otoriter û hişk ya kolonyalîst, yekîtiya Împartoriya Osmanî parastin ne mimkûn e û divê ku sistem gorî rastiyên plûral ya olî û neteweyî û gelî jinûve realize bibe. Sistemeke ne merkezî/ademî merkezî ava bibe. Prens Sebahaddîn yek ji wan kesan bû ku Osmanîciyê jinûve şirova dikir û osmaniya nû wek fikrekî û senaryoyeke nû pêşniyar dikir. Lewra

Prens Sebahaddîn dinya û Ewropa nas dikir; sistemên siyasî nas dikir. Jiyana neteweyan ya hevmeşterek dikare çawa û di çarçewa kîjan sistemê de bimeşe dizanî. Lê desthilatdarên Osmaniyan dixwestin ku sistema kevn ya otoriter û hişk ya kolonyalîst bimeşin.

Împartoriya Osmanî, her çiqas hat xwestin jî sistema ya hişk û nedemokrat neguhart û xwest ku sistema xwe bi awayekî hişktir bidomîne û lê biserkeneket. Gel û neteweyên balkanî di sedasala 19-an de ji Împartoriya Osmaniyan veqetîyan û bûn neteweyên azad û welatên serbixwe.

Li Împartoriya Osmanî encama nasyonallîzm û pêvajoya dewletên milî parçebûnê dest pê kir û di destpêkê de jî gelên balkanî, di vê pêvajoyê de biserketin. Azadbûna gelên balkanî û serxwebûna welatên balkanî, di nav Împartoriya Osmanî de tirseke mezîndir dest pê kir, ku neteweyên ereb, kurd, ermen jî dê ji Împartoriya Osmanî veqetîyan û bibin dewletên serbixwe. Di wê qonaxê de di dawiya sedsala 19-an û destpêka sedsala 20-an de li Împartoriya Osmaniyan pêvajoyeke nîjadperesîyê ya tirk û îttîhat terakkîciyê dest pê kir. İttîhat Terakkîciyan ji bona, ku yekîtiya Împartoriya Osmanîyan biparêze û gelên bindest azad û serbixwe nebin, dest bi zulmeke mezîndir kirin û li hemberî neteweyên bindest, bi taybetî jî li hemberî kurdan û ermeniyan siyaseteke gelek dijwar ya nîjadperestî meşandin.

Ermenî ji bona ku gelekî ne Îslam û xirîstîyan bû, îttîhat terakkîciyê ditirsîyan ku welatên ewropayê dê ji wan re xwedî derkevin û emenîsteneke serbixwe ava bikin, di destpêka sedasala 20-an de di sala 1915-an de li hemberî gelê ermenî jenosîdek meşandin û di ev jenosîda xwe de jî bi serketin.

Lê ev tîrsa wan piştî Şerê Cîhanê yê 1-emîn bû rastiyeke. Piştî ku Împartoriya Osmanî şer wenda kir di sala 1920-an de girêdayî Peymana Sewrê Împartoriya Osmaniyan mecbûr ku avabûna Ermenîstanê û Kurdistanê re, bibêje erê. Ev peyman encama daxwaza Rojavayê û Ewropayê pêk hat, Hezar mixabin dîsa bi îradeya Ewropayê jî ev peyman ji holê rabû. Lê di destpêka sedsala 20-an de jî gelên ereb ji Împartoriya Osmaniyan veqetîyan û bûn xweser û ketin bin mandeya Îngilîz û Fransîziyan.

Di encamê de ez dikarim bibêjim, ku sedema parçebûna Împartoriya Osmanî, netewe û gelên bindest. Azadbûn û xweserbûna van gelan bû. Dema ku gel û neteweyên bindest azad û serbixwe bûn, welatên wan ji Împartoriya Osmanî veqetîyan, erdê Împartoriyê biçûk bû. Rejîma Kemalîst jî, piştî salên 1919-yê û bi taybetî jî piştî sala 1923-an Împartoriya Osmanî ji holê rakirin û rejîma sultanî/qraliyetê û xelîfetiye dawî anî û Komara Tirkîyeyê wek dewleteke nû ya unîter û neteweya tirk ava bû. Kurdistan bes wek kolonî ji Komara Tirkîyeyê re ma. Îro jî, desthilatdarî û kolonyallîzma Komara Tirkîyeyê li Bakurê Kurdistanê dom dike.

Pîrsa netewetî ya kurd, pîrsê gelek girîng e û di vê pîrsê de sergejiyek heye. Her dîrokanek, sosyologek, siyasetavan û rewşenbîrek di vê pîrsê xwediyê nerîneke cihê ye. Min jî ev mijara, di gelek nivîsarên xwe de aniye ser zimên û bi taybetî jî di televizyonan de jî ez li ser vê pîrsê rawestiyam. Wusa diyar e, ku careke din divê ku li ser vê pîrsê bê rawestandî.

Ji bona vê du, an jî sê pîrs hene ku bîndir zelal kirin.

Pîrsa yekem ev e: Civata Kurd, gel û neteweya kurd jî, beşek ji mirovatîyê ye. Qanûn û pîvanên giştî û objektîf ji bona hemû civatan, gelen, neteweyan derbas dibe, ji bona civata kurd, gel û neteweya kurd jî derbas dibe. Ji bona vê, di merheleya nekapolîtîst de ji bona kurdan jî, ji nasyonallîzmê behs kirin, ne ilîmî ye. Ji bona kurdan, gel û neteweya kurd jî, nasyonallîzm, fikrên neteweyîbûnê, netewetî, neteweparêzî di merheleyekê de derketiye holê, mîsyon û rola xwe lêhistiye.

Pîrsa duyem: Pêvajoya fikrê azadîbûnê, netewetî û nasyonallîzmê, wek dem û wek naverok divê ji hevûdu bê veqetandin. Fikrê azadîyê di avabûna civatan de dest kiriye û heta îro domandîye. Fikrê netewetî û nasyonallîzmê, di merheleyeke taybetî û bi taybetî jî beriya Şoreşa Fransayê demêkê dest pê kiriye û piştî şoreşê pêşketiyê û wek kategoriyeke fikrî derketiye holê.

Dema ku em bi van qanûnan û pîvanan li civata kurd, li pêşketin û guhertina kurd mêze bikin, di fikrê azadîbûnê, nasyonallîzm û netewetîbûnê de, du pêvajoyên cihê derdikevin pêşiya me.

Çanda kevneşopî ya Kawayî û Newrozê xwediyê dîroko-ke gelek kevn e. Di

kurdan de fikrê azadîbûnê bi çanda Kawayî derketiyê holê, pêşketiye û heta îro jî dom dike. Kurdan wek civat di her merheleyekê de ji bona azadî xebat û têkoşîn daye. Çanda Kawayî û Newrozê jî, di ev xebat û têkoşîna azadîyê de ji kurdan re rêberî kiriye û moral û zindîbûn daye kurdan. Ji bona vê Newroz, sembola azadîyê û têkoşînê û serxwebûn û rizgariya civata kurd û neteweya kurd e.

Fikrê netewetî û nasyonallîzm, di merheleyekê derengtir de derdikeve holê û di merheleke pêştir de jî wek kategoriyeke fikrî pêk tî. Fikrên netewetî û nasyonallîzmî di dema Ehmedê Xanî de dest pê dike. Lê di destpêka sedsala 19-an de reng û ketoriyeke tevgerê qezenç dike.

Lewra tê zanîn û peji-randin, ku Kurd civateke û gelekî hindî-ewropayî ye. Gorî bawerîya min, di pêşketi-na civata Ewropayê û neteweyên ewropayê û civat-netewe kurd de paraleliyek, li hevguncenbûnek heye. Li Ewropayê di nav neteweyên ewropayî de nasyonallîzmê, beriya Şoreşa Fransayê pîr zû dest pê kir û piştî Şoreşa Fransayê kategorîze bû û ji bona dewletên milî û unîter bû bingeh û bû paradig-meyekê.

Di kurdan de jî fikrê neteweyî di dema Ehmedê Xanî de heta vê rojê, di nav pêvajoyê de pêş ket û di destpêka sedsala 19-an de bi tevgera Şêx Ubeydullahê Nehrî û Tевgera Mîr Bedîrx-anî bû destpêka dewleta netewetî ya kurd.

Pîrsa seyemîn: Netewetîya kurd jî gelek kevn e. Netewetîya kurd di sala 1840 de bi serhildana Ubeydullah Nehrî digihîje qonaxa dewlet avakirina milî ya Kurdistanê.131. Hezar mixabin ev serhildana serkeftî nabe.

Di destpêka sedsala 20-an de bi taybetî jî piştî ku encama Peymana Lozanê Kurdistan dibe çar parçe û kolonîyeke navneteweyî, serhildanên li çar parçeyên Kurdistanê rûdan jî, encama ev netewetîya xurt û dîrokî ye. Armanca van serhildanan jî dewleta neteweyî ya Kurdistanê bû.

Hezar mixabin ew serhildanan jî serkeftî nebûn. Encama serhildanê ji bona neteweya kurd gelek trajedîk bû. Serok û bi hezaran têkoşerê tevgera milî hatin kûştin. Li Kurdistanê qetîlmeke xerab domand..

Ew pêvajoya netewetî li Kurdistanê hîn jî dom dike. Li her parçayê Kurdistanê jî li qonaxêke cûda ye.

Siyasetmedarekî Bakûrî bo destpêkirina "piroseya aştiyê" daxwaza alîkariyê ji Barzanî kir

Şaredarê berê yê navçeya Sûr ya Diyarbekirê Abdullah Demîrbaş, ji bo destpêkirina piroseya aştiyê li Bakûrê Kurdistanê, daxwaza alîkariyê ji Serok Barzanî kir.



Abdullah Demîrbaş ji Kurdistan24ê re axifî û got: Serok Barzanî xwedî hêzeke navnetewî ye û li navçeyê jî bandora wî xurt e. Divê piroseya çareseriyê careke din destpê bike û Barzanî kare ji bo destpêkirina wê piroseyê roleke giring bilîze.

Demîrbaş rexne li HDPê jî girt û got: Heger wan karîbana siyasetek rast bimeşandana û ji bo çareseriyê fişar li dewletê kiribana, wê demê xendeq jî nedihatînin kulandin.

BasNews

Şandekê Herêmê ji bo vekirina riya Hewlêr-Kerkûk serdana Bexdayê dike

Rêvebirê polîsê Hewlêr û endamê şanda Herêma Kurdistanê ji bo Bexdayê (Ebdilxaliq Tel'et) ragihand, ku îro şandekê Herêma Kurdistanê bi mebesta encamdana gotûbêjan ji bo vekirina riya di nav Hewlêr û Kerkûkê de, serdana Bexdayê dike.



Ebdilxaliq Tel'et diyar kir, ku ew bihêvî ne karibin li gel aliyên Iraqî, li ser vekirina wê riyê lihev bikin û got: Pirsên teknîkî yê vekirina wê riyê bidawî hatine û derbarê pirsên emnî emê li gel Iraqê gotûbêjan bikin. Bi sedema bûyerên 16ê Cotmeha 2017an, riyê sereke di nav Hewlêr û Kerkûkê de hat girtin û welatî bi neçarî hin riyên din bikartînin daku serdana Kerkûkê bikin.

kurdistan24.net

Nivîsingeha Erselan Payîz daxuyaniyek belav kir

Piştî ku, endamê serkirdayetiya YNK Erselan Payîz ji serokatîya lîsta YNK vekişiya û li cihê wî Qûbad Talebanî hate danîn nivîsingeha wî dax-



yaniyek belav kir. Di daxuyaniyê de hat ku, îro, ez hatim agehdar kirin daku, bibin serokê lîsteya YNK bo helbijartinên parlamentoya Kurdistanê, lê ji ber ku, ez 4 salan bûme endamê parlamentoyê û 4 di serokatîya perlemanê de min daxwaza lêborînê kir bi min xweşe ku, hevareke din bibe serokê lîsta YNK.

Herwiha endamê serkirdayetiya YNK Erselan Payîz sipasiya hemû heval û dostên xwe ku, ew ji bo wê postê namzed kiribûn.

BasNews

Yûra Nabîêv: Biryara avakirina Konfederasyona Diyasporayên Kurdan biryareke dîrokî ye Bernameya radyoya Ria taza "Civak û sîyaset" – 43

Dema we bi xêr be, guhdarên ezîz! Radyoya Ria taza dest bi bernameya xwe "Civak û sîyaset" dîke. Ji bernameya "Civak û sîyaset" ya radyoya Ria taza ya 43 yan ji bajarê Moskwayê ez, Bêlla Stûrkî bi xêrhatina we dikim. Çawa hûn pê dizanin, her du heftê carekê, zaniyar, karmendên civakî, nivîskar, rojnameger, hunermend û sîyasetzanên kurd yê naskirî dibin mêvanê bernameya "Civak û sîyaset", yê ku weke 35 deqeyan bersîva pirsên me didin derbarê rewşa siyasî û civakî li hemû parçeyên Kurdistanê û li cîhanê. Em bi hêvî ne, ku îcar jî bernamaya me wê bala we bikişîne, bi gorî dilê we be û bersîva gelek pirsên me bide.

Guhdarên hêja, îro jî Civak û Sîyaset di carçovaya bernameya derbarê Diyasporaya kurd, derheqa pêkanîna koordînasyonê hevbêş ya Rawenda Kurdên Diyasporayê ku li civîna 10an ya sibata îsal ya Rêxistinên sîvîl yê

Kurdên Diyasporayê li Stockholmê Swêdê hate li darxistin, nê û armanca damezirandina konfederasyona




kurdên Ewropayê, herwiha derheqa Konferansa Federasyona Navnetewî ya Civaka Kurd (FNCK) yê Sovyêta berê, ku di destpêka meha tebaxê li Moskwayê dê bê li darxistin, herweha derheqa plan û

proje, xebat û çalakîyên wê saziyê ji bo piştgirîya doza Kurdistanê, li gel hemû serokên wan komele û rexistinan ku di Konfederasyonê de cihê xwe girtine, gotûbêjan dîke. Vê carê Bernameya Civak û sîyaset ji bo zêdetir zelalkirina wan pirsan û mijarên din yê rojane mêvandarîya lêkolîner û pisporê sîyasetê, serokê Komeleya Piştewanî û Hekariya bi gelê Kurd re, Cîgirê Serokê Federasyona Navnetewî ya Civaka Kurd (ya welaten Sovyeta bere), berpirsyarê sereke yê malpera Ria Taza birêz Yûrayê Şamil Nabîêv kir.

Birêz Yûra Nabîêv re ji stûdyo radyoya Ria taza bajarê Moskwayê ra em bi radîotêlêfonê hatin girêdan. Fermo, guhdarîya pirsên me û bersîvên serokê Komeleya Piştewanî û Hekariya bi gelê Kurd re, Cîgirê Serokê Federasyona Navnetewî ya Civaka Kurd (ya welaten Sovyeta bere), berpirsyarê sereke yê malpera Ria Taza birêz Yûra Nabîêv bikin. Amadekar û rêvebira bernamêyê Bêlla Stûrkî ye.

Salih Muslim: Em ji bo rizgarkirina Idlibê amade ne!

Endamê Komîteya Têkiliyên Derve yê TEV-DEMê Salih Muslim di derbarê pêşatên dawîn de li bajarê Qamişlo yê Rojavayê Kurdistanê civîneke çapemeniyê lidar xist. Hevserokê PYDê yê berê û Endamê Komîteya Têkiliyên Derve



yê TEV-DEMê Salih Muslim di derbarê Efrînê de diyar kir ku 140 hezar kes koçber bûne û got, "3 hezar çekdarên DAÎŞê û 25 hezar çekdarên din li Efrînê hatine bicihkirin. Ev her roj êrişî sîvîlan dikin. Lêbelê li Efrînê şerê gerîla berdewam dîke. Efrîn bo me weke birînekê ye. Dezgehên navdewletî tevî ewqas bînpêkirinan jî bêdeng

in. Li ser Efrînê konseptek heye." Salih Muslim di derbarê geşedanên li bajarê Idlibê de jî wiha axivî: "Li Idlibê gelek komên çekdar û hejmareke zêde ya çekdaran hatine bicihkirin. Rêkeftina me ya li gel hevpeymanîya navdewletî ji bo şerê

amade ne ji bo diyalogê. Di hevdîtinên dawîn de heta niha rejîmê baweriyek nedaye me. Ji bo dewamkirina hevdîtinan pêdivî bi aliyekî navbeynkar heye. Divê garantorek hebe. Divê garonorek hebe ku herdu alî qebûl bikin."

Salih Muslim diyar kir ku Rêveberiya Xweser ji civînen li Asatan, Soçî, Cenevre û li deverên din hat bi dîrxistin û wiha pê de çû: "Li derveyî Sûriyê bîn û bêjin em ê krîza Sûriyê çareser bikin, nabe. Rê û rêbazên me jî hene. Divê em nemînin li benda aliyên derve ku bîn û kêşeyên me çareser bikin. Em ji bo çareserkirina kêşeyan federalîzmê pêşniyaz dikin û em amade ne gotûbêjan li ser bikin."

Muslim di derbarê rûdanên li Suveydayê ku di êrişekê de zêdetirî 200 kes hatibûn kuştin got, "Xelkê Suveydayê durî ye, ne misilman in. Têkiliyên me bi wan re hene. Wan jî modelê ku me li Rojava birêve dibin, pêk dianî. Tiştê li Suveydayê rû dide ti ferqa wê ya ji li Şengalê rû da nîn e. Hêza wan a xweparastinê hebûya niha ev yek çênedibû. Em êşa wan parve dikin. Ji bo parastina wan ti pêwîst be em amade ne bikin."

BasNews

Encûmena komisyaran hejmarek ji rêveberên nivîsingehên xwe ji kar dîrxistin

Encûmena komisyaran a ku, ji dadweran pêkhatibû biryar da hejmarek ji rêveberên nivîsingehên komisyona bilinda serbixwe ya helbijartinên Iraqê ji kar dîrbixe û wan dadgeh bike. Encûmena komisyaran di daxuyaniyê de biryar da rêveberên nivîsingeha Selaheddîn, Kerkûk, Enbar û navendên Tirkîyê dadgeh bike.

Amaje bi wê yekê kir ku, biryar bi li ser raspardina komîteya ku, ji aliyê encûmena wezîran a dem bi ser çûye derket. Ev yekê di demê de ye ku, proseya cudakirin û hejmartina dengên helbijartinên 12ê Gulanê berdewam e û nehatine ragehandin.

BasNews



CIWANTIRÎN BÎRANÎN

“Sekvan! Belê ez benî? Dapîra te çawa ye? Dapîra min çû ber dilovaniya Xwedê ez benî.”

Piştî tēkçûna Mihabad, rêya man û nemanê li ber me xuya bû. Ji bo maweyekî em vegeyiran Başûrê Welêt. Her çende li vir jî ji bo me tenahî tunebû, lê bi rengêkî nihênî



demeke diyar em li deverê man. Paşê em gehiştin biryarekê, heta ku helûmerc dest bidin divêt em ji warê xwe bar bikin. Li dûv biryara hatiye standin diviya em çûbûna Sovyetistanê û em bi rê ketin. Li devera Mako, li derdora Agiriyê biçûk arteşa Îranê rê li ber me girt. Em naçar man ku bi şer rêya xwe vekin û şerekî dijar ku mawey çend rojan domand di navbera me û arteşa Îranê de dest pê kir. Piştî çend rojan li ser daxwaza Îranê, di encama danûstandinan de rê li ber me hat vekirin û ber bi Rûbarê Arasê ve em bi rê ketin. Helbet, di rê de em tûşî gelek astengan hatin, lê me hemî asteng bi rengêkî herî serkeftî li paş xwe hiştin. Nizanim çendemin roj bû, bi berbanga sibê re em gehiştin perê gundekî Celaliyan.

Li perê gund malek hebû û digel du hogirên xwe, bi armanca çûna wê malê em bi rê ketin. Pîrejnek li hêwanê, li ber tîfikê rûniştî nanê sêlê dipehtand. Li nîva hêwanê jî zarokekî 8-9 salî, li ber wî sênîkek mast, nanê xwe tê dakir û dixwar. Piştî me rojbixêra Pîrê kir, me pîrsa rewşa gund û Keyê gund kir. Me ji pîrejînê re got ku em mahkûm in û pêdiviya me bi alîkariyê heye. Pîrê, di destpêkê de bi bêdîlî nêzî me bû. Ji me re go: -Ma ne şerm e ji we re, ma hûn

fedî nakin ji bejn û bala xwe. Hûn ev zirpeyên han, hûn çî digerî li van çolan? Min go: -Başe pîrê, ka em bi kû ve herin? Pîrê yekser go: -Herin Çiyayê Kurdistanê. Waye li wir Mele Mistefa şer dike. Li şûna ku hûn li van deran bêserî bigerin, herin xwe bi qurban kin ji bo Kurdistanê hey xwelîseran.

-Pîrê ev kurik çiyê te ye? -Ew neviyê min e. Bavê wî mir, dayîka wî jî çû ser qismetê xwe. Ez neviyê xwe xwedî dikim. -Dayîka min a hêja, navê neviyê te bixêr? -Navê wî Sekvan e -Pîrê, bi serê Sekvan, ez Mele Mistefa bi xwe me. Em şikestin. Em niha derbeder in. Lê bi destûra Xwedêyê mezin, heta em bi ser xwe ve tên, emê dîsa vegeyiran Kurdistanê xwe. Digel dawîhatina peyva min, pîrê tîra xwe ya nanpehtîne danî û bi wan destên arvankirî rabû ser xwe û hat, bi axînk û keseran û bigiriyekî şewat ez himbêz kirim. Piştî ev danûstandina bi pîrê re, gundî bi me hesiyân, Keyê gund hat em dîtin, bi germî bixêrhata me kirin û karwanê me bi rohilat re derbasî gund bû. Em du rojan li vî gundî man. Gundiyân di xizmetê de hiç kêmasiyek nekirin. Piştî bêhnedaneke dirêj ya bi qedr û bi qiymet, digel dadana tariyê karwanê me bi rê ket. Gava karwanîyan xatir xwestin û derketin derveyî gund, ji ber ku rêya me jî hindik mabû û pêdiviya min bi birroyê nema bû, ez bi tenê vegeyiran ew mala li perê gund. Hatim dev ew pîra jêhatî û min jê re go: Pîrê, li gerdena me aza bike, çî dibe û çî nabe. Mirin jî heye, piştî salan hevdtin jî heye. Ev Birno ya min e û ez dixwazim diyarî Sekvan bikim. Heta mezin bibe û jê re bibêje; ev diyarî ya Mele Mistefa ye..

Piştî vegeyiran welêt di sala 1958'an de, careka din wekû caran tevgera jiyana Kurdewarî jî hemî aliyên ve û bi hemî xurtiya xwe ve dest pê dike. Konferans, Kongre, Rêxistinên Civakî, Leşkerî û yên mayî.. yek li dûv yekê dihatin sazîkirin, dihatin damezrandin. Û 11 Êlûnê 1961, şoreşa jiyane dest pê kir. Sal 1963. Rêberê şoreşê ji bo qoleçana derdorê derdikeve serê girekî raserî derdorê û bi dûrbîne derdorê qoleçan dike. Li vî alî û li wî aliyê çiyê Pêşmerge wek pêlên avê tîn û diçin. Hinek bar dikin, hinek bar dadixin. Her wekû govendek ne serî û ne jî binî heye, her kes tevdigere. Û ji nişka ve got.. -Ew çî ye? -Ew kî ye li van deran digere? -Ew li van deran çî digere?.. Û bi lezûbez jî serê çiyê ber bi newalê ve hate xwar. Û yekser çû li paş Pêşmergeyêkî rawestiya û destekî xwe dirêjî ser milê wî kir û bi nazdarî got: Sekvan.. Ewê Pêşmerge bi nermî serê xwe zivîrand û bi nermî bersiv da: Belê ez benî.. Piştî vê hevdtin û vê hevnasîne bi du salan Sekvan beşdarî karwanê nemiran dibe.

“Pîrê, li gerdena me aza bike, çî dibe û çî nabe. Mirin jî heye, piştî salan hevdtin jî heye. Ev Birno ya min e û ez dixwazim diyarî Sekvan bikim. Heta mezin bibe û jê re bibêje; ev diyarî ya Mele Mistefa ye.

Dildar Şeko



Axaftinek xweş Li dor Amûdê bi Seydayê Saadeddînê Seyda re

Bajarê Amûdê..! Amûda Bavê Mihemed..! Bajarê ku di destpêka çerxê 20'an de dergêhê wê ji xwiniyên serhildana Bedlîsê/1913'an, mehcirên Hesenan û Heyderan/1914'an, Ermenî û Siryanîyên fermana/1915'an, Şêx û Melayên xwînî ji serhildana Diyarbekirê/1925'an re, vekirî bû.. Amûda ku Axayên wê (Ibrahîm Axa û biraziye wî Seîd Axa) û tev malbatên wê ve, bi sîngêk fireh pêşwaziya mişextî û mehciran kirin.



Ji bo bêtir agahiyan li dor Amûdê, di roja 16/7/2018'an de, digel Dr. Mustafa Henê (Henîfê) çûm Amûdê, Amûda Bavê Mihemed, serdana Seydayê Saadeddînê Mela Abdullatifê Seyda kalemêrê zane, rastgo, welatperwer û xweşik.. Û min çend pirsên panoramî li dor Amûdê û xelkên wê jê kirin. Wî jî, nermî nekîr, bi dilekî fireh bersiv pirsên min dan û li wan zêde kir.. Seydayê Saadeddîn pesnekî baş da malbatên Amûdê yên dêrîn wek malbata Axê (Ibrahîm Axa û biraziye wî Seîd Axayê Deqorî), malbata Heciya (Heci Abdullah), malbata Silîva, malbata Henê

(Henîfê), Kamil, Kero, Şiwêş, Mandiya, Qirno, Gun Reş, Seyid Elo, Ezabiya.. Û ronahî ber da ser merdî û dilfirehiya xelkên Amûdê ji mehcir û mişextiyên re.. Nexasim ji Şêx û Melayên ku ji ber zilm û zora kemalîstan revyan bûn û xwe li Amûdê digirtin wek; Ibêdellahê Hêzanî (Seydayê mezin) û birayê wê Mela Fethallah, Mela Abdullatifê Mela Ibrahîm, Şêx Ehmedê kesk, Şêx Zahîrê, Şêx Beşîrê Hamidî, Şêx Sebxetellahê Hamidî, Seydayê Sedeqê, Şêx Mecîd.. Û ji min re got; du dibistan li Amûdê hebûn; dibistana (Henefiya) û (Şafeîya), di wan dibistanan de gelek cûreyên ilm û zanîne dihatin dersdan wek: Camî, Mintiq, Belaxe, Muxter-sir Ma'anî, Bînaa Elesas (Ilmê Serfê) û icaze nedihat dank ku zimanê Farsi nizanîbana.

Li dor cixrafiya Amûdê jî, ji min re qala Girê Şermola, Girê Amûdê (Kemaliyê), Newala Xasa (Kanîkuriyê), Çemê Zeraê, Xanî Sorê, Qelaçê Silokevirê, Newala Necara kir.

Bêguman di vî çûna min î Amûdê de, Seydayê Saadeddînê Mela Abdullatifê Seyda baş bala min kişand.. Belê balkişandina mezin ku ta roja îro, hîn du ode li Amûdê hene: Odeya mala **Emo** ji malbata Heciya û odeya malbata **Henê**. Ev herdu ode, wek heyamê berê, bi kulavan raxistî ne, civat di wan de digerin, qehwe û çayê li mêvandan digere.. Bê TVê ne.. Ji aş û bajar ve qal û qult bi **Kurmancî** têne gotin.. Min odeya mala **Henê** dît û pê kêfxweş bûm, bi hêvî me rojekê odeya mala **Emo** jî bibînim. Bi rastî, van herdu odeyên ku temenê wan dor sed salî ne, hinekî hêviyên min geş kirin ku hîn em bi xêr in..!

Not: Hêjaye gotinê, Seydayê Saadeddînê Seyda di sala 1926'an de li gundê Sefihê Çaçan hatiye dinyê. Ew kurê Mela Abdullatifê Seyda ye, yê ku di pişt Seydayê xwe Ibêdellahê Hêzanî de, melatiya mizgefta mezin li Amûdê kiriyê.

Konê Reş

Xewsê Hêzanê, Mamostayê Mezin û

“Yê ku yekî filleh bikuje naçe Cînetê”

Di biçûkaniyê de, gelek caran min navê **Xewsê Hêzanê** ji neferên malbatê û xelkên gund dibihîst. Nexasim dema ku li wan teng dibû û çare ji problem û pirsgrîkên xwe re nedidîtin. Hingî berê xwe didan asman û digotin; **(Ya Xewsê Hêzanê! Hawar û gaziya me li ber te ye.. Tu di hawara me de were..)**. Bêtir jinan hawar û hêvî ji Xewsê Hêzanê dixwestin.

Ji wê hingê ve, ez di navê Xewsê Hêzanê de difikirim, bê ku bersivê zelal bibînim.. Piştî ku mezin bûm, min xwendin û serwextî dîrok û rewşenbîriya Kurdî bûm, careka din Xewsê Hêzanê hat bîra min. Min ji xelkên derdora xwe pirs kirin, wek Şêx Efrî Huseynî, berî ku di sala 2014'an de li Amûdê here ber dilovaniya Xwedê û vê paşiyê jî, ji mamoste Rêber Seyda ku ji malbata mamostayê Mezin e.. Wan baş agahî ji min re gotin û di encam de navê Xewsê Hêzanê û gundê Hêzanê ji min we diyar bûn. Di sala 2010'an de jî, dema ku çûm Wanê, nêzîkî Bedlîsê em di ber rêka ku diçe Hêzanê re derbas bûm..

